Peyker

Ebdilrihman Bamernî

Hosa hemî peyker
çavên wan dizil û nivîstî
Ji hişyarbûnê derdikevin û
diçine di xewnan da..!
Nexşeyan wêne diken
Nexşeyan didirînin
Dergehan vediken
Dergehan dûr û kilîl
diden..
Eve diçîvanokan jî da
Pirça wan li ber xudîka
dihate şekirin
Rû yên wan dihatine
mikiyaj kirin
Rû yek bo hizirikirinê û
pêvedanê
Rû yek bo têrikirina hez û
şehwetan!
Hemî dûr bo peykeran
divekirîne
Giriyan... Qîjî..., û dişevan
jî da
Perda bêdengyê dihête
ladan
Digewiriya wan da
Deng û qîjyên kiçan
Diselîqeyeka nû da
Bi kêşe û serwa dihête
belavkirin
Hemî belavuk jî
Digel vebûna pencereyên
wan dihêne xandin
Bêdengî û heşameta
miruva
Li ser cadeyên dirêj
Dinav tariyatiya şevan da
Dibine lê lê û
Çavan di sojin
Dengê muzîkeka kûra dûr
Muzîkeka rûsa çiblaqe
Ji jenîna leşekê jibîrikirî û
Xardan digel şevan kirî
Çûye ve dizîndana mêşkî
da û maye ve peyker
Bûyeve peyker û
Liber sîngê me xazowkyê
dike
U cade ji bêhnên wê yên
kurt
Hemî tiştan jibîr dike!
Wek hemû peyvên li ser
pertûk û kaxezan

Hatîne nivîsandin û hatîne jibîrikirin..
Barove heku dirabûna xwe da
Dikevîte pêla û sîbera xwe jî dikete zivirok
Xwe li fîrika polîsekê hatuçwê jî nagire
Hemî ziman bi hiçik kurtyê piyasan diken û
Hêj em yê li sîbera xwe digerîn
Radihêlîne mêjwê
Ew mêjwa ji peykeran destpêkirî û
Em birîne di mêşkê peykeran da ve..
Husan me li cadeyan
Hemî tişt bi wêrekî digotin
Çend xweş bo heku peyker bê cilik dihatine dîtin
Me pê bo peykeran çêdikirin
Kesê nediviya bimînît peyker û
Dîsan hemiya viyan bibine peyker ve!
Sêguşeyeka mêşkê min neşiyay xwe digel biguncîne
Xewnên me yên diçin û
Divên dibêdengyê da xwe lîs bikin
Evebûn xewnên tablûyekê serinişîf hatî ye hilawîstin
Tablûyekê wermtî û ji hemû rexa jiber êk çwî
Ewê peykerek têda hatî ye nimayşikirin
Ew peykerê pirça wî li ber xudîka hatî ye şekirin
Hejêkirina min bo tablwî
Tariyatiya şevê ya xwe bi ser daday û
Cilkên wê yên jiber diranidîn
Ji hîngê were nim nima şevan bûye selîqe û di serê minda û
Hêj ez û şir yê bi dev û lêvên êk ve
Ne ew şir
Li çi ziman û welat û qutabxanan
Hatî ye xandin û wergêran û belavkirin!
Nek ez jî wek şair
Gotîne min dê bî ye peyker...